Zelalkirina bûyerê!

#bîranîn #dadwerî #encam

Roja 19.02.2023 - sê sal di ser erîşa nijadperestene ya li bajarê Hanau re derbas dibin û heya niha jî û xizm, qurbaniyên bûyerê û kesên ku pirştevaniya wan dikin ji bo zelalkirina pêvajo û bûyerên şeva sûcê şer dikin. Ji Kanûna 2021-ê ve, ew li hember desthilatdarî û sîstema dadweriyê di komîteyeke lêkolînê de radiwestin, ku ew û hin xizmên kesên ku hatine kuştin xistine bin gumana raya giştî.

Mînak û cihêkariya rêkxistinîkirî li vir dîsa têne dupatkirin, ji ber ku em wan pir caran piştî kiryarên tundrewane yên nijadperestî û dijatiya Cihûyan dibînin - piştî ku sûc li hemberî mexdûran tê kirin, qisûr û pirsgirêk dikevin stûyê ciyê ku ji wir hatine û dikeve ser milên kesên rizgarbûyî û xizmên qurbaniyan.

Ev jixwe di vekolînên li ser Naziyên Veşartî yên terorîst û rastgir de zêdetir xuya dibe û ji bo xizmên qurbaniyan bi salan şermezariyê li pey xwe ve tîne. Tiştek wisa derheq êrîşa dijî Cihûyan û nijadperestî ya li bajarê Halle ev e: Di roja êrîşê de û piştî wê jî, polîs û rayedaran reftarên cihêxwazane û ne hestyar li hemberî kesên rizgarbûyî nîşan dan, ku ev yek eşkere dike ku ew me têra xwe parastî bûn û ne jî bi rengekî xweşik têne parastin.

Destpêşxeriya 19-ê Sibatê ya Hanau dibêje:

Bêyî bersivdazîna gelek pirsên vekirî, bê ronîkirin û bê encam, dadwerî çê nabe.

Gelek ji wan kesên ku mexdûr bûne dibêjin: Heya ku pirsên me yên vekirî neyên bersivandin û heya dema ku encamên siyasî neyên dîtin, ewê aramiyê bi xwe ve nebînin.

Em îsal jî dixwazin di çarçoveya salvegerê de li Halle çalakiyek nenavendî li dar bixin da ku mirovên ku hatine kuştin bi bîr bînin û cihekî taybet bidin dengê kesên rizgarbûyî,

xizmên wan û Destpêşxeriya Hanau ya 19-ê Sibatê.

Çi, kengî û li kuderê?

Naziyên Veşartî û Hanau - Êrîşên Nîjadperestane li Almanya

Fîlma "Êrîşa Duyemîn" wê bê pêşandan

Bi jêrnivîsa Tirkî

Roja 02/06/2023'an

Ji demjimêr 18.00'an ve dê hin gotûbêj ji bajarê Hanau bêne guhdarîkirin

Demjimêr 18:45 destpêka fîlmê ye

Cih; Pushkino

Kardinal-Albrecht-Straße 6

06108 Halle (Saale)

#bîranîn #dadperwerî #encam

Em dixwazin roja 02/19/23 li bajarê Hanau bin. Em plan dikin ku di 18-ê Sibata 2023-an

de bigihîjin hev. Heke hûn jî dixwazin werin, ji kerema xwe heya 9-ê Sibata 2023-an bi me re têkilî daynin

fahrt_nach_hanau@riseup.net

Ji bo ku kesên ku dikaribin bi me re werin, em hewl didin ku alîkariyan kom bikin an jî ji bo piştevaniya madî pereyên ku têne mezaxtin li ser bingeheke hevgirtî bidin.

Hemî agahdariyên heyî li ser Destpêşxeriya 19-ê Sibatê ya Hanau û raporên ji komîteya lêkolînê li vir têne dîtin:

https://19feb-hanau.org/

Herweha ji roja 01.02.2023-an ve pêşangeha "Sê Salên Bîranîn û Zelakirinê" heya 18-ê Adarê, 2023-an li Hanau dikare were dîtin.

https://19feb-hanau.org/2022/12/23/hanau-19-february-2020-three-years-remembrance-and-clarification/

nur für den blog

Gelo hûn dixwazin roja 19-ê Sibatê bîranînek nenavendî bikin an jî balê bikşînin ser salvegerê û neh qurbaniyên bûyerê û afîşekê daliqînin? Heke wisa be, hûn dikarin şablonek çapkirinê ya postêrê ji vir dakêşin. Şablon di mezinahiya A3 de ye lê dikare mezintir jî bibe.

Bi rengekî baş ji bo çapê ji vir dakêşin:
Postêra A3-Ji bo bîranîna 9 qurbaniyên Hanau